NEPIRSIN ÇIMA?

Cankurd

“Min deftera xwe da hev
  û pênûsê xwe şikand
Min pencereya xwe,
        ya bi ser Rojhilat ve vekirî bû,
girt
Min çireya ser xwe vemirand
      û stêrka xwe ya li ezmên,
  bi xwe rijand
Dizanim ji rê hîn pir maye
Rêyek bi rojan û şeva ye
Bi salan û meha ye
Lê ji bo xatirê Xwedê
      Ne pirsin: Çima?
Ji hevpeyvîn û pirsan re
Dem a dilê minê melûl
  tew nema..

Bila ez kevirek bama
di sîngê „Keloşkê“

Bi dîtina deştê têr bibama

Bila ez darek hejîrê bama
  li ber zinarê „Bûkê“
   bila bi tenê xwe bama

Bila ez şalûrek bama
  li geliyê „Tîra“
An jî kanîsarkek bama
  li nav çiyayê „Hawarê“
    bi avdana qerajên zuwa,
        bila ez mijûl bibama
An jî tew nebama
   tune bama...

Ma ne bese?
Her roj di ser serê te re
  di paş pişta te re
    di ber sîngê te re

û di nav çavên te re
Ev şanowa direwkaran
Li ser sîngê neteweyeka bindest
û hejaran
Van şergehên hevxwaran
  û ev tablowa gurên çile, zik-
birçî û dev bi xwîn...
  va tablowa hezar hezar tofan
û maran

Ma ne bese?
Van devgezên rojane?
Va reva mezin a, bê behane?
Ji her şêweyekî dirûtî û direw?
    û tev ji hev re bûne kew?”

Helbestvan ji tariyê re wilo got.
Devê xwe jî bi heft kêliyan dirût

    û di destpêka beharê
xwe ji jor ve avêt xarê...

Ji wê rojê ve
Helbestan bû şepeleka bi xumx-
um û lêwlêw
  ji wan şepelên ava robarê.

09.08.2006